




Miqdad Bedirxan



Roja Rojnamegeriya Kurdî



Mûsa Enter

Rojeke cejn û pîroz e !

Bi armanca geşkirina zanîn û bilindkirina asta rewşenbîriyê di civaka Kurdî de, yekemîn car di dîroka gelê Kurd a nûjen de, li roja 22ê Nîsana sala 1898an, ronakbîrê Kurd ê payebilind, Mîr Miqdad Midhet Bedirxan rojnameyeke du heftane bi zimanê Kurdî, navê "**Kurdistan**" û tîpên erebî li paytexta Misrê (El-Qahîre) çap û belav kiriye, û ew roj li nik Kurdan bûye roja şahiyê, bûye cejna rojnamevaniya Kurdî.

Lê, wekî her kesê dîrok û jiyana vê rojnameyê xwendiyê, dizane ku di bin bandora şêwirmendên xwe yên şoven de, yên mîna Ebu Elhuda, sultan Ebdulhemîd bi tundî şerê derçûna rojnameya Kurdistanê kiriye û biryara qedexekirina wê li ser xaka dewleta Osmanî daye. Rojnameya Kurdistan neçar dimîne, ji Misrê bar dike û li Ewropayê cîwar dibe, li wan welatan jiyana xwe berdewam dike, û tîrêjên zanîne davêje Kurdistanê. Careke din, Sultan hewil dide ku vî dengî nebihîse, şerê derçûna wê li Ewropayê jî dike, lê ew di hewldanên xwe de têk diçe. Bi cefakêşî û vîneke xurt, çar salan rojnameya Kurdistan li ber xwe dide, 31 hejmaran diweşîne û li roja 14.04.1902an, hejmara dawî ji vê rojnameya nixdar çap dibe, û ew bêdeng dibe !

Di rewşeke ewqas têkilhev, dijwar û aloz de ku gelê me yê Kurd û tevgera wî tê de dijî, û ji ber ku rojane ew tûşî êrişên tund ên derûnî, leşkerî û pîlanên ji hevexistina civaka Kurdî ji hêla xêrnexwaz û hêzên terorîst ve, ên deverên me dorpêç kirine dibin, erk û ustûbarê hemû nivîskar, medyakar û alavên ragihandina Kurdî ew e ku li hemberî van pîlanan bêdeng nemînin, û bi hemû hêzên xwe aramiya civak û herêmên xwe biparêzin. Di vî warî de, ji bo belavkirina çand û gotara hevrêzî û hezkirinê di civaka Kurdî de xebateke îjdlî pêwîst e. Neyarên hebûna me, ji bo çavên me kor bikin û em pîlanên wan nebînin, wekî her car, ew dixwazin kî û nakokiyên di navbera Kurdan de gur û geş bikin, da ku em di nav toz û dûmana vî şerî de pêkolyê bikin û her xwelîser û bindest bimînin!. Di bin çî perde û navnîşanê de dibe bila bibe, ew çand û gotara nakokiyên xwexwetî geş dike û dide pêş, ew berjewendiyên xêrnexwazên gelê me destek dike û civaka me ber bi taromariyê ve dibe, girînge li hemberî wê em rû bi rû derkevin.

Li dawiyê, bi helkefta vê bîranîna giranbuha, em cejna hemû nivîskar, medyakar û xebatkaran pîroz dikin, hêvî û omîda me ewe ku her ew şiyar û zîrek bin, beşdariyê di weşandina çanda nûjen a mirovahiyê de bikin, û her ji bo xebatên aştî, azadî û wekhevîyê, amade û li kar bin!.

- ✓ **Rêz û silav ji nemir Miqdad Bedirxan û şehîdê rojnamevanî û peyva azad Mûsa Enter re.**
- ✓ **Azadî ji hemî rojnamevanên girtî re .**

15.04.2015Z-2627K

**Komîta Çand û Ragihandinê ya
Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd Li Sûriyê**